

Bi buhakerina nirxê mazot û benzînê rewşa welatiyan xerabtir dibe

Kurdistan Sîham Mihemed



Careke din rêveberiya Partiya Yekîtiya Demqratîk PYD nirxê mazot û benzînê bilind kir, bêyî ku bi biryareke fermî belav bike, vê yekê jî dilgiraniyek li cem welatiyan peyda

kiriye û dixwazin nirxên sotemeniyê erzan bibe. Welatiyek dibêje, madeya mazotê li deverê û ji bo welatiyan gelekî giring e û bi buhabûna wê dê rewşa welatiyan xerabtir bike, û wê bandorê li

ser gelek waran bike, û bi vê yekê bargiraniyek dirust dibe. Welatiyek din dibêje, vê care rêveberiya PYD bi fermî nirxê sotemeniyê bilind nekir ji ber ku ditirsiya xelk xwepêşandanan

li dijî wê encam bidin wek sala 2021ê dema biryara 119 derxist ku nirxê sotemeniyê 300 ji sedî bilind kiribû, parzûngehên sotemeniyê hemû li Kurdistanê Sûriyê ne, û di jêr destê

wê de ne, gelo çima nirxê tene bilindkirin, ev hemû sûda wê ji bo hejmareke kesayetiya vedgere, û xelk jî dibin qurbanê biryarên wan yên çewt.

Serok Barzanî: Pêwîste Kurdên Kurdistana Sûriyê xweragir bin

Kurdistan-Ehmed Eli

Serok Mesûd Barzanî roja 18ê Hezîrana 2022 an li Selahedîn ligel şandeke bilind a Encûmena Niştimanî ya Kurdî li Sûriyê ENKS bi serokatiya Siûd Mela civiya. Di hevdîtîne de li ser rewşa Sûriyê gotûbêj hat kirin û şanda Encûmena Niştimanî ya Kurdî li Sûriyê ENKS hûrgilî û geşedanên herî dawî yên li ser rewşa gelê Kurd li Sûriyê û nîgeraniyên welatîyên Kurd li ser siberoja xwe ya li Sûriyê, bo Serok Barzanî behs kirin. Herwiha di hevdîtîne de Serok Barzanî têbînî û şîretên xwe yên li ser rewşa gelê Kurd li Sûriyê pêşkêş kir û tekez kir ku divê welatî û ciwanên gelê Kurd li Sûriyê cih û welatê xwe

bi cih nehêlin û xweragir bin. Herwiha di civîna Serok Mesûd Barzanî û Balyozê Almanya li Iraqê de, metirsiyên egera encamdana operasyoneke Tirkîyê li ser Kurdistana Sûriyê û derencamên wê hatin guftûgokirin. Di vê dema dawî de Serok Barzanî di hemû civîn û dîdarên xwe de ligel balyoz û qunsulên welatan behsa rewşa Kurdistana Sûriyê û pêşeroja Kurdên wê dike, ew tekeziyê jî li ser mafê rewa yê gelê Kurd li Sûriyê dike û dixwaze Kurd li Sûriyê wek hemû pêkhatayên din bighên mafên xwe. Welatîyekî bajarê Qamişlo derbarê vê peyama Serok Barzanî wiha dibêje, bi rastî hertim Serok Barzanî xemxurê Kurdên Kurdistana Sûriyê ye, û di civînên xwe de ligel

serkirdeyên welatan beşekî dide mijara rewşa Sûriyê û Kurdên Sûriyê, û bi xurtî jî li ser vê pirsê radweste û tekez ew hewil dide tiştêkî ji Kurdên Sûriyê re bike, û rêkeftinên Hewlêr û Duhokê li ber çavê hemû dunyayê diyar be ku wî dixwet rêkeftinekê di nava aliyên Kurdî de çê bike, lê me dît çawa Partiya Yekîtiya Demokratîk PYD bi fermana PKK nehişt ev rêkeftin bighê serî û vê yekê bandor li rewşa xelkê Kurdistana Sûriyê kir, û rewşa jiyana wan jî hemû waran de têk da. Welatîyê bi navê Siwar jî dibêje, Encûmena Niştimanî ya Kurdî li Sûriyê ENKS barekî mezin li ser mile wê ye û pêwîste karekî cidî bike heta ku rewşa xwe ya siyasî vegeerîne mîna berê li

ser erdê û hebûna xwe bihêz bike, cemawerên Encûmena Niştimanî ya Kurdî li Sûriyê pîrr in, lê divê karekî ji bo vegeera baweriyê bê kirin, ev civîna ligel Serok Barzanî dê bibe bingehek ji bo vegeera vê baweriyê, Serok Barzanî dest ji piştewaniya gelê Kurd li Kurdistana Sûriyê bernade û ew dizane di salên teng û dijwar de xelkê me alîkariya şoresên Herêma Kurdistanê kirine, û ew qet vê yekê jibîr nake. Raste rewşa abûrî gelekî xerabe, û jiyana xelkê me jî ber grûpên çekdar di jêr metirsiyê de ye lê heta ku bikaribin wek Serok Barzanî gotiye xweragir bin û dest ji xal û mal û milkên xwe bernedin, jî berk u bi koçberiya wan dê demografiya deverê were guhertin

û li şûna wan dê xelkê biyanî bi cih bibin, û ev yek metirsiyeke mezin li ser pêşeroja Kurdistana Sûriyê. Welatîyek din dibêje, pêwîste Encûmena Niştimanî ya Kurdî li Sûriyê kar li ser vê yekê bike û hewil bide pirsgerêkên abûrî yên xelkê nemînin û hinekî jî êş û azarên wan sivik bike û fişarê bixe ser rêveberiya PYD heta ku rewşa abûriya welatîyan baş bike û cegera vê rêveberiyê nebek u nîrxê kelûpelan û sotemeniyê zêde bike û ev yek bargiraniyekê li ser welatîyan dirust bike, ya giring di vê demê de xelkê me rastî şikestina derûnî nebe û xweragir be, û xwe radestî ti alyekî neke ku berjwendîya wan naxwaze û jî bo wan jî ti karî nake.



Efrîn baca nakokiyên grûpên çekdar dide

Kurdistan-
Bidûvçûn

Desteya Tehrîr El-Şam Cebhet El Nusra ya berê piştî şer û prevçûnên bi grûpên çekdar ên ser bi Tirkîyê ve re, hejmarek ji gundên Efrînê kontrol kirin û nêzîkî bajarê Efrînê bûye. Roja 18ê meha Hezîranê şerekî giran di navbera Desteya Tehrîr El-Şam (Cebhet El Nusra ya berê) û grûpa Feyleq El-Şam de li aliyê başûr û rojavayê Efrînê derketiye û Desteya Tehrîr El-Şam destê xwe daniye ser hejmarek ji gundan. Desteya Tehrîr El-Şam karî bajarokê Cindirêsê û gundên Dêrbelût, Dêwa û Til Silorê kontrol bike û heta gundê Xezewiyê û Basûtê hatiye. Li gor zanyariyan, çekdarên Feyleq El-Şam ji gundên Basûfan û Baiyê yê navçeya Şîrawa û dergêhê Xezawiyê ku herêmen Efrîn û Idlibê ji hev vediqetîne, vekîşyan û li şûna wan çeteyên Desteya Tehrîr El-Şam bi cih bûn û gundên navçeya Şîrawa û Cendirês kontrol kirin. Her li gor zanyariyên xwecihî, Desteya Tehrîr El-Şam hêzên mezin li gundên ku kontrola kirine kom kirine û amadekariya ketina bajarê Efrînê dîke. Ji aliyekî din ve, Tevera Ehrar El-Şam ragihand, wê bi piştgiriya Desteya Tehrîr El-Şam gundê Eyn Dara yê li başûrê Efrînê kontrol kir, da ku kêmtirî 5 kîlometreyan dûrî bajarê Efrînê bikeve. Li gor zanyariyan di encama şerê di navbera wan her du grûpan de, ji bilî çekdaran, hejmarek ji kesên sivil jî hatine kuştin û birîndarkirin. Roja 19ê meha Hezîranê hêzên artêşa Tirkîyê ji xalên xwe yê li derdora navenda bajarê Efrînê vekîşiyane baregehên xwe yê li nava bajêr. Desteya Tehrîr El-Şam daxuyaniyek belav kiribû û tê de ragihand ku wê li dijî herêmen di bin kontrola artêşa Tirkîyê û komên girêdayî wê ve, dest bi operasyoneke berfireh kiriye. Her wiha

Desteya Tehrîr El-Şam di daxuyaniya xwe de bang li grûpên Artêşa Niştimanî kir ku çekên xwe deynin û xwe radest bikin. Piştê li gor hatiye belavkirin, bi fermana artêşa Tirkîyê, Desteya Tehrîr El-Şamê (Cebhet El-Nusra berê) ji hin gundên Efrînê yê kontrol kiribû, vekîşiya. Rewangeha Sûriyê diyar kir jî, hîn beşek ji hêzên Desteya Tehrîr El-Şamê li gundê El-Basûtê yê kom dibin,

ku wesayîten giran û tank li gel wan hene. Li gor zanyariyên Rewangehê, di şer û aloziyên du rojên borî de yê di navbera Desteya Tehrîr El-Şamê û grûpên çekdar ên ser bi Tirkîyê de, 4 kesên sivil hatin kuştin, di nava wan 2 zarok hene û 11 sivil jî birîndar bûne ku di nava wan zarokek heye û rewşa birînen wî giran e. Rewangehê amaje bi wê da, şer û pevçûnên nû di navbera baskên "Lêwaya

Sêyemîn" bi serkêşiya Cebhe El-Şamiyê ji aliyekî û Tevera Îslamî "Ehrar El-Şam" ji aliyekî din ve, li gundên Sûsiyan, Hedas û Ebla yê derdora bajarê Babê, li rojhilatê Helebê derketin. Li bajarên Kurdîstana Sûriyê û bakurê Sûriyê yê di bin kontrola artêşa Tirkîyê û grûpên çekdar de, her car şer û pevçûn di navbera wan grûpan bi xwe de derdikevin û her car jî welatiyên sivil dibin

qurbanî. Çalakvanekî Efrînê ji Rojnameya Kurdistan re dibêje, niha pîlanek li wê deverê heye ku ew dever bikevin jêr kontrola Desteya Tehrîr El-Şam de, lê ev yek dê li ser qonaxan be, bi rsatî zirarmendê mezin her milletê Efrînê ye, ji berk u şer û alozî ziyane dighîne dar û zewiyên wan. Welatiyek jî dibêje Efrînê ji nava agirekî dikevin nava agirekî din, û ew ti carî ji êş û azaran rizgar nabin.



AV Û AGÎR - Çîrok



Xemgîn Remo

Hewar hewara jinan û girîyê zarokan ji nav çadîran , di nav dengê girîna ewra û şîrîna birûska de wenda dibin , taviyek bi bager girtiye ser zeviya zeytûna û baran û zîpîk di ber hev didin . Meha avdarê pêkve bi qir û serma bûriya , penaber bendewarê meha avrêlê û rojnî bi tîn bûn , ku wê xweş û geş be û kesî bîra lehiyê nedibir , ku wê di nav ava sar û zîpîkê de bimînin , pîra mence dîke hewar (hahoo ev çi xezebe ! ?) û berê xwe dide kalemêrê xwe , ku di bin betaniyê de , kabokên xwe gihandibû çena xwe û bê zar çixare ya xwe dikşand , (kuro rabe karekî bike , em dinav avê de man wey) kalê wê , bi hêrs û awirî tûj lê vedan (keçê ma ezê çi bikim hey pîra merisî ? ezê destê xwe li ber baranê vegrim , ez çi bikim ?) di wê kêlikê de tîrêjnî boş ji ezman rijîyan û girînî bi ewra ket , her du neviyên kalo , bi tîrs xwe avêtin himbêza pîrê û bi girîyêkî dînoke digriyan .

Tavî bûriya bû , baran û zîpîk rawestiya bû , lê dengî qîje qîja jinan û girîyê zarokan , hîn berdewam bû , çadîrên gelek malan bi ser serê wan de hatibûn xwarê û sitûnê çadîrên ketî hin zarok û mezin birîndar kiribûn , çadîrên ku ne ketibûn jî , bi tevayî di nav avê de mabûn , şênîyên kampê ketibûn bizavê de , pêdiviyên xwe ji nav avê dikşandin cihên bilind û şaxên dara di bin tûrik û çentan de çimiya bûn , gelek qûtên malan berbat bibûn û nema dihatin xwarin , şevê bi hewar û gazî , qêrîn û girî bûriya . Sibehê ezmanekî şînsayî û rojê geş , çadîrên

penabera kelmezo ji wan bilind dibû , hin kalemêr û pîrejî li hev kom bibûn û ji hev re digotin (me taviyên wiha ne dîtine , ev çi taloz bû ?) hina jî digotin (bi xwedê me gelek taviyên wiha dîtine , lê em di hindirê xaniyên xwe debûn û hayê me ji bayê felekê nebû , ne wek niha di bin dar û çadîran debûn) dengê tang û topan ji çiya yê roava dihat û dûyên reş û sipî ji wan derdora bilind dibû , li ber derê çadîrêkê bû hewar hewara jinan (çi bû law ? vêca çiyê ?) bi rohilat re şênîyên kampê , kurekî yek salî , ku di bin çadîrê ketî de xeniqî bû veşartibûn , (dibêjin bûka seydo jî mir) pîrejînekê li rûyê xwe da (pepûkê belengazê .. ji destpêka taviyê de , ketibû ber qoinca de , xêr nedîtê berê wê yê yekem bû û dergûş jî çênebû , wax .. wax) Bûka seydo , hîn bi tamamî ne hatibû veşartin , firokeyek hilîkopter di ser kampê re bûriya û sê bermîlên teqîner jê hilweşîyan , zeviya zeytûna di nav keldûmanê de ma , geşroja buharî li serê penabera bû dojah , pêtiyên êgir zeviya zeytûna û ser û binê çadîran dabû ber xwe . Ew çend kesên ku ji nav agir rihabibûn , bi mêr û jin û zarokan hijmara wan digha pazde kesan , berê wan li sînorê bakur bûn û çi kesî li dûv xwe ne dinihêrî , pîra mence û bûka xwe di gel herdu kurikên biçûk , ew jî di nav wan debûn û kalo jî di nav agir de hatibû sotin , şênîyên wê kampa ku dihatê sotin , ta bi berî şeş mehan jî , nişteciyan gundekî efrîne bûn , di rojêke payizî de , yekîneyek rêjîmê di gel hin çeteyên talankar ku ji wan re dibêjin (şevenge) hêrîşî gund dikin , bi behaneyê ku gundê wan piştgiriya çeteyan dikin , yê ku li dijî rêjîmê şerdikin , çend genca dikujin û çendakî din dil digrin , ji nav wanê dilgirtî yek jê kurê pîra mence , bavê herdu kurkan bû , di

pêre agir bi gund dixin û gundî pêkve koçberî nav wê zeviya zeytûna bibûn . Bi gotinên pîr û kalan , hîn rok sê bejna mabû , gava ku gihan ber têlbendên sînor , singoyên tivinga di nav têlbendên bi kelem re , ketin sînga wan de û dengêkî berz (rawestin .. rûnên) û çend gule di ser wan re berdan , du kalemêr di nav koçberan debûn , yekî ji wan destên xwe berjor vekir , mero ne dizanî ku lavîjan ji xwedê dike yan ji serbazên tirk dike û bi dengêkî kelogirî (law em ji nav agir direvin agir .. bila hindek dilovanî bi were hebî , hema ji bo van zarokan) serbazek ber bi wan ve hat , berê tivingê dide wan û bi kurdî dipirse (xêre .. ? we çi divê ?) gava ku serbaz bi kurdî dipirsî , kalo hinekî geşbîn bû , ku wê ya dilê xwe bê astengî dikaribe jêre bêje (law em ji nav êgir direvin kurê min , ji şênîyên gundekî , em vana bi tenê mane , me xwe li we girtiye , ma hun nizanin me çi divê ?) û ew jî bi zarokan re digriya , ku ji dengê teqîna gulan tirsîya bûn , xuya dikir ku yê serbaz jî bi wê dîmena li pêşberî xwe bandor bibû û bi dengêkî xembar got (bila hinekî bihna we fire bin , emê niha bi fermandarê xwe re têkevin têkeliyê) û sê çar şûşe yê avê di ser têlbenda re hatin li nav wan ketin , her wekî ku nuh av hatibe bîra wan , zaroka hemîyan bi hev re av dixwestin . Piştî ku pîra mence av da herdu zarokan , rûnişt , bi serê xwe girt û bi nalîn digot (wey li minê wey li minê wê çawabe ? emê çi xweliyê li serê xwe kin ? çi felek li serê me geriya hewarê , digotin : emê rêjîmê bixin ! ev sê sal bûn û rêjîm hîn li cihê xwe ye , malên me wêranbûn û em di nav linga re çûn , em man li çol û çebela û dawî li kuye xwedêyooo) Zarokên birçî bi tîrs û lerizîn , di himbêzên dê û dapîrên xwe de dixewre çûbûn , mêr û jin jî bi ser xwe de diponijîn , girî



jî nema ji wan dihat ku bigrîn û mîna ku peyv û gotin bê watene û çi birîna derman nakin , li hêviya narvînê bûn , ku çarenûsa wan binûsîne . Dengê tang û topa , bédengiya wê şeva sînorî bê aram dikirin , lempeyên sîror pêketibûn û serbaz li aliyê din di kefileftê debûn , li vî aliyê din jî , carna penabera di ber xwe de sixêf didan , carna jî lavij dikirin , ku

ji vê astengiyê riha bibin , rohniya turimpêlekê bi giranî di ber sînor re dihat , dawî giha raserî penabera û rawestiya , serbaz dîsa ketin bizavê de , du serbaz hatin têlbend bi dirêjbûna mitrokê dan alî û ji wan re gotin (werin) û yeko yeko li dûv hev , wan di xaçerêkê re derbasî wî alî dikirin , her wiha sê serbaza jî , wan dibirin di basê de bi cih dikirin .

Bersiva Nameya Evîne



Emel Hasan

Min bibore evîna min
Ey Mîrê textê xewnên min
Ne ji ber ku ez ji te aciz im
An jî ji te heznak im

Min berseva te ne da

Baş bizane delalê min
Jîn û jîyan îro toyî
Dil û ceger îro toyî
Hest û rewan îro toyî

Nav û nişan her tim toyî

Çendî dûrî te nêzîkî
Bawer neke ji min dûrî
Tu Leşkerê Nav şêrînî
Tu Mifteya dilê min î

Tu Serbaz î û Rêbaz î

Raste îro ez dûrî te me
Perîşanê Kenê te me
Bawer bike Xuştiviyê min
Hiş û raman li ba teye
Çavên girî li ser teye
Tu axîna dilê mirî
Tu nalîna canê sêwî
Te hebûna hemî gavan
Ji bîr nabe sedên salan
!Tê bimîninî evîna Dûtman